Ji pirtûkxana Casimê Celîl 3

H. Tûmanyan

# NEZERÊ MÊRXAS



Wien — 2012

H. ŢUMANJAN

# NƏZƏRE MERXAS



NƏŞRA HYKYMƏTA ŞEWRA ERMƏNISTANE
JEREVAN 1937

Ji pirtûkxana Casimê Celîl 3

H. Tûmanyan

# Nezerê Mêrxas

Werger Casimê Celîl

Wien - 2012

Çapkîr — Înstîtûta kurdzanîyê - Wien (IKW)

**H. Tûmanyan: Nezerê Mêrxas**

Werger — *Casimê Celîl*
Rêdaktor — Emînê Ewdal
Nîgar — *M. Arûtçyan*
Weşana pêşin — 1937 Rewan
Karê kompyûtêrê — *Lûsîka Gêrman*
Mîzanpaj — *Cemal Celîl (Alionis)*

ISBN 3 - 902185 - 24 - 4



## Nezerê Mêrxas

### 1

Dibe-nabe merîkî belengaz dibe, navê wî Nezer. Ew Nezer merîkî bêmerîfet û tembel dibe, xwe jî ewqas tirsonek, ewqas tirsonek, wekî herkê te wî bikuşta jî, tenê gavek jî ji cî nedilipitî. Sibê heta êvarê rex jina xwe rûdinişt,

tev wê diçû derva, tev wê jî dihate mal. Bona wê yekê jî navê wî datînin Nezerê tirsonek.

Ev Nezerê tirsonek şevekê tev jina xwe derdikeve ser şêmîkê, diçe derva. Çaxê ku derdikeve ber dêrî, dibîne wekî şeveke hîve xweşe, dibêje:

– Jinik, çi şeveke bazirganbirînêye? Ez dibêm hema rabim, herim pêşîya wan bibirim, bînim mal tijî kim...

Jin dibêje:

– Dengê xwe bibire, cîyê xweda rûne, tu li bazirganbirîyê min binhêre...

Nezer dibêje:

– Jina nes, tu çima nahêlî ez herim pêşîya bazirgan, bibirim, talankim, bînim mal tijî kim. Êdî ez mêrê çime, êdî çima ez kum datînim serê xwe, wekî tu dil dikî ber min xeberdî?

Ku gelekî şer dike, jinik dikeve malê derî ser dadide.

– Xwelî serê teyî tirsonek be, de naka here pêşîya bazirgan, bibire.

Eva Nezerê me derva dimîne, ji tirsa ziravqetyayî dibe. Çiqas jê teweqe dike, reca dike,



wekî jin derî veke, çare pê nabe, derî venake. Çara wî tê birînê, diçe bin dîwarekîda diqincile, bi tirs û ricaf şev derbaz dike, hetanî sibe safî dibe. Nezer bi xeyd bin berojê dîwarê, bin tev disekine, wekî jina wî bê wî bibe mal û fikir dike.

Roja havînêye germe, mêşêd nes, xwe jî ewqas tembele, wekî taqet nake pozê xwe temiz ke, mêş jî tên ser pozê û lêvê wî rûdinên, tijî dibin. Wextê ku gelekî êciz dikin, destê xwe hildibire li rûyê

xwe dixe. Çaxê ku li rûyê xwe dixe, mêşa dikuje, mêş li ber tijî dibin.

– Wa... ev çîye? – ecêbmayî dimîne.

Dixweze bijmire, bi derbekê çend mêş kuşt, nikare. Difikire, wekî ji hezarî kêm nîne.

– Wa... dibêje, ez merîkî wa bûme û heta îro min nizanbûye? Ez ku bi derbekê dikarim




hezar serî bînber heywan bikujim, êdî çima rex evê jina bêkêr rûniştime?

Ji vira radibe hema rast diçe cem keşîşê gundê xwe.

– Keşîş, Xwedê te xwey ke.

– Xwedê te jî xwey ke, lawo.

– Keşîş, lê tu nabêjî tiştekî wa qewimî?

Mêrxasya xwe şirovedike û pêra jî melûmetîyê dide, wekî wê ji jina xwe dûr keve, tenê reca dike, keşîş mêrxasîya wî binivîse, wekî inda nebe, gişk jî bixûnin, pê bihesin. Keşîş jî bona laqirdî ser pînekî dinivîse: “Nezerê mêrxasî nealtbûyî, ku yek lêxe hezarî dikuje”.

Û dide wî.



Nezerê me jî ew pîne ser serê darekê qewîn girêdide, şûrekî zengorî bi pişta xwe girêdide, kera cînarê xwe sîyar dibe û ji gund diçe.

## 2

Ji gundê xwe derdikeve, rêk dide ber xwe û diçe. Xwe jî nizane ev rê kuda dibe.

Diçe û diçe, carekê jî pajda dinhêre, dibîne ku ji gund dûr ketîye. Hema vira jî tirs dikeve dilê wî. Bona ku dil bide xwe, bin pozê xweda dike ginegin, distirê, xwe bi xwera xeber dide, ser kerê hêrs dibe... Çiqas diçe dûr, ewqas jî tirsa wî zêde dibe, ciqas ku tirsa wî zêde dibe, ewqas jî dengê xwe bilind dike, qareqar, qajeqaj, hewar û gazî dike, pêra jî ker dike zirezir. Ji vê qareqarê û qîrînê teyrê ser darêd nêzîk difirin, kêwrîşk ji bin belga direvin, beq jî ji hêşnayê xwe davêjin avê.

Nezer dengê xwe diha bilind dike û sewdeserî dibe.

Lê çaxê ku dikeve nava mêşe, wî tirê, wekî ji bin her darekê, ji bin her belgekî, ji pişt her kevirekî, wê niha cenewir yan qaçax hucumkin




ser, ji tirsê dike qîreqîr, usa dike qîreqîr, bira nekeve guhê te.

Tu nebêje hema evî wextî gundîk nişkêva hesp dikşand û mêşêda dihat. Eva dengê ecêb çewa ku dikeve guhê wî, disekine.

– Wa, dibêje, ez jî gihîştime vira, unda bim?

Heye tune, evana cerdin...

Hespa xwe dihêle, dikeve mêşê binatara rê, du lingê wî hebûn, dûdû jî deyn dike û direve.

Bextê te hiz kim Nezerê mêrxas, bi qareqar tê dibîne, hespeke zîn kirî orta rê sekinîye bona wî. Ji kerê peya dibe, evê hespê zînkirî rûdinî û dîsa di rîya xweda diçe.

## 3

Zef diçe, hindik diçe, digihîje gundekî, xwe nenasî gund, gund jî nenasî wî. Kuda here, kuda neçe? Ji malekê dengê zurnê dibhê, hesp dajo ber bi wî dengî, diçe dikeve maleke dewatê.

– Roja we xêr!

– Xêr, ser sera, ser çeva! Tu xêr hatî, ser sera hatî. Kerem ke, kerem ke, mêvan mêvanê Xwedêye.

Evî bi beyraqa xweva dibin serê texteyî jorin didin rûniştandinê. Çevê te li xweşyê be, êdî çi tu bêjî tijî ber dikin, herkêk xwerin, herkê vexwerin. Dewatvan dipirsin, dixwezin bizan-bin kîye ev mervê ecêbî nenas, yekî serê jêrinda rûniştî yê kêleka xwe rûniştî dev dide û jê di-




pirse, eva jî yê rex xwe rûniştî dev dide, wa bi sirê hev devdanêva û pirskirinêva şixul digihîje keşîşê serê jorinî rûniştî.

Keşîş bi teherekî nivîsara ser beyreqa mêvanê nenas dixûne:

Nezerê mêrxasî nealtbûyî.
Ku yek lêxe, hezarî dikuje.

Dixûne û xofgirtî yê kêleka xweyî runiştîra dibêje. Eva jî yê kêleka xweyî rûniştîra dibêje, eva jî yê sisyara dibêje, yê sisya jî yê çarara dibêje, wa gilî digihîje hetanî binatara dêrî û mala dewatê dike gimîn, "Lê tu nabêjî mêvanê teze bi xwe,




Nezerê mêrxasî nealtbûyî,
Ku yek lêxe, hezarî dikuje".

– Wa, Nezerê mêrxase... – merîkî pesnê xwe dayî, dike gazî, – çiqas hatîye guhastinê, min carekêva nas nekir... Û merîyê usa jî peyda dibin, yê ku mêrxasîya û kirinêd wî, usa jî nasbûna xwe berê û rojêd tev hev derbazkirî şirovedikin.

– Lê çima, bi mervê usara tu xulam pêra tu-

nene? – bi ecêbmayî merîyêd nenas dipirsin.

– Edetê wî usane, hiz nake bi xulamava bigere. Carekê min jê pirsî, got, ezê xulam çi bikim? Dinya temam xulamê minin, tenê xulamê minin.

– Lê çima, şûrekî wî qeydetî tune, eva hesinê zeng girtye pişta xweva grêdaye.

– Merîfet jî hema di wêdane, wekî bi evî parçê hesinî jenggirtîva yek lêxî hezarî bikujî, yanê na bi şûrê başva, çi heye ku? Egîtê mayîn jî dikûjin.

Û cimet jî şaş bûyî ser pîya disekine eşqa Nezerê mêrxas vedixwe. Mervê nav wanda terbet jî radibe pêşberî Nezer xeber dide, dibêje:

– Me zûva bihîstibû navê teyî mezin, em hesreta dîtina te bûn û wa îro em bextewarin, ku em te cêrgê xweda dibînin.

Nezer dike kizîn û destê xwe dihejîne.

Cimetvan jî bi sîyanet çev didine hev, fem dikin, wekî ev kizîn û hejandina dest çiqas tişt nîşan didin.

Aşiq jî, ku wêderê bû, pêra-pêra kilam diefirîne û distirê.

Tu xêr hatî, tu ser çeva hatî,
Teyrê sîmir çîyayê me,
Tac û pesnê dinya me
Nezerê mêrxasî ne altbûyî,
Ku yek lê dixî, hezarî dikujî.

Tu gumana belengaza,
Tu wana aza dikî ji her derda,
Tuyê me aza kî ji neheqa
Nezerê mêrxasî nealtbûyî,
Ku yek lêdixî, hezarî dikujî.

Em qurbana beyraqa tene,
Şurê pişta te, kumeyta bin te,
Lingê wê, pock, rewşa wê,
Nezerê mêrxasî nealtbûyî,
Ku yek lêdixî, hezarî dikujî.

Û dewatvanê serxweş belayî,
Her cîya dikin, wekî tê,
Nezerê mêrxasî nealtbûyî,
Ku yek lêdixî, hezarî dikujî.

Derheqa mêrxasîya wîye ecêbda şirovedikin û her dera navê zarêd xweyî tezebûyî datînin Nezerê Mêrxas.



Nezer ji mala dewatê dertê u di rîya xweda diçe. Diçe digihîje deşteke çayîr, çîman. Hespa xwe evê deşta çayîr-çîmanda berdide diçêre. Beyreqa xwe dinikîne, xwe jî bin sîya beyreqêda vedileze, radizê.

Tu nebêjî hevt dêwê birê hev hene, hevt cerdbaşî, ev cîyana jî yê wanin, koçk-sera wan jî li serê çîyayê nêzîke. Ev dêwana jorda dinihêrin, dibînin, wekî merîk hatîye deşta wanda peya bûye. Gelekî ecêbmayî dimînin, ku ewî çewa dil kirîye, bi çend serîyane, ku bêtirs hatye nav kewşenê wanda rehet peya bûye û hesp jî berdaye diçêre. Her yekî ji wana gurzekî çil ritilî hebû, ewana gurzêd xweyî çil ritilî hiltînin û tên. Tên çi dibînin, wa hespek diçêre, merîk jî kêlekê razayî, li ber serê wî jî beyreqek çikandî, ser beyreqê jî nivîsîye:

"Nezerê mêrxasî nealtbûyî,
Ku yek lêxe, hezarî dikuje".

– Wey, Nezerê mêrxase... – dêw tilîyêd xwe digezin û cîyê xweda sarbûyî disekinin. Tu nebêje gilîyê dewatvanê serxweş gihîştye wana jî.

Wa tuka wana devê wanda miçiqî, ewana zîyabûyî disekinin, hetanî ku Nezer xewa xwe distîne û hişyar dibe, çaxê ku hişyar dibe, çevê xwe vedike, dibîne hevt dêwê bira gurzêd çil ritilî ser mila, li ber serê wî sekinîne, êdî çokê wîda taqet namîne. Derbazî pişt beyraqa xwe dibe û diriçife, çewa belgê payîzê diheje. Çaxê ku ev dêwana dibînin, ku ewî rengavîtî diricife, wana tirê ku hêrs bû, niha çewa jî be, wê bi derbekê wan hevta jî bikuje, ber wî vedilezin ser erdê û jê rica dikin:



Nezerê mêrxasî nealtbûyî,
Ku yek lêdixî, hezarî dikujî,

Me navê teyî egît bihîstibû, em hesreta dîtinya te bûn, em naka bextewarin, ku tu bi lingê xwe hatî erdê me, em xulamê tene, em hevt birane, wa koçk-sera me jî serê çîyayê hane, xûşka meye bedew jî têdane. Em hîvî dikin, tu layîq bibînî bêyî nanê me bibirî.

Vira bîna Nezerê me tê ber, hespa xwe sîyar dibe, ewana jî beyreq hildidin, dikevin pêşîyê û bi sîyanet û hurmet dibin koçk û sera xwe.

Dibin koçk-sera xwe mîna padşa jêra hurmet dikin û ewqas mêrxasîya wîda xeberdidin, ewqas pesnê wî didin, wekî dilê xûşka wane bedew dikeve Nezer, çi soz, hurmet û sîyanet jî bêjî pêra zêde dibin.

## 5

Evî wextîda pilingek peyda dibe û ewî welatîda tirs û xof dike dilê gişka. Kî wê piling bikuje, kî wê nekuje, hilbet ku Nezerê mêrxas wê bikuje. Êdî kî wê dil bike here pêşîya piling?

Gişk li rûyê Nezer dinhêrin, jorê Xwedêk, jêrê Nezerekî mêrxas.

Çaxê Nezer navê piling dibhê, ji tirsa direve, dixweze bireve here mala xwe, lê mervê sekinî difikirin direve, ku here piling bikuje. Dergîstîya wî dide sekinandinê:

– Tu bêsîleh, bêtiving kuda dibezî? Sîlehê xwe hilde, paşê here.

Sîleha wî tîne, dide wî, wekî here ser hurmeta xwe mêrxasîk jî zêde ke. Nezer sîleh hildide û derdikeve diçe. Diçe mêşe, bilindî ser darekî dibe, ser dar xwe vedişêre, wekî ne ew rastî piling bê, ne jî piling rastî wî bê. Ser dar diqincile, êdî kî wê Nezer bibîne, ruhê wî bîye hebe garis. Hema pilingê bêxweyî jî tê bin evî darîda vedileze. Çaxê ku Nezer piling dibîne, ziravê wî dibe av, ber çevê wî reş dibe, dest û pîyê wî sist dibin û bi gimîn ji ser dar dikeve ser pişta piling. Piling tirsyayî ji cî banzdide. Nezer jî ji tirsa xwe ser pişta piling xwe qewîn digre. Wa bi tirs û xof, ziravqetyayî, Nezer ser pişta piling zeliqyayî, piling jî direve, çewa direve, çawa direve, êdî çîya û banî, çol û deşt kevir û

zinar napirse. Merî nişkêva dibînin, wa Nezerê mêrxas piling sîyar bûyî dajo.

– Hewar, ha hewar, werin ha werin, Nezerê mêrxas piling kirye hespa xwe, sîyar bûye dajo... Lêxin, ha lêxin... Gişk jî bi her alîyava dilê xwe qewîn dikin, bi qîrîn, qurîn, bi hirehir hucûm dikin, bi qeme, bi şûr, bi tiving, bi kevr û bi dar, lêdixin, dikujin.

Çaxê ku hişê Nezer serda tê, zimanê wî vedibe, dibêje:

– Heyf. We çima kuşt? Bi zor min ew kiribû hesp û lê sîyar bûbûm... Minê aqas bajota...

Xeber diçe dighîje koçk û serayê. Mêr û jin, mezin û biçûk, mexlûqet derdikevin derva bona hurmeta Nezer, ser Nezer kilam derdixin û distirên:

Di vê dinyayê,  
Li cêrga merya,  
Kî dikare bibe angorî te?  
Tu Nezerê Mêrxas.

Çewa teyrê sîmir,  
Çewa birûsk û agir,



Ji kela bilind firî hatî,
Tu Nezerê Mêrxas.

Piling cenewar,
Te kir hespê xwe,
Tu sîyar bûyî çîya bi çîya,
Tu Nezerê Mêrxas.
Te me aza kir,

Te me xilaz kir,
Sîyanet tera dewr û zemana,
Tu Nezerê Mêrxas.

Û Nezerê mêrxas bi xûşka dêwaye bedewva zewicandin. Hevt roj, hevt şev dewat kirin. Bi kilam pesnê padşê û xanim xatûnê dan.

– Hîv derket çîyê,
Ew mîna kê bû?
– Hîv derket çîyê.
Ew Nezerê Mêrxas bû,
– Tev teze şeweq veda,
Ew mîna kê bû?
– Tev teze şeweq veda,
Ew xanim, xatûn bû?
Padşayê me sor bû,





Teva wî jî sor bû,
Tac jî sor, wa sor bû,
Kinc jî sor bû, wa sor bû,
Piştok sor bû, wa sor bû,
Kondre sor bû, wa sor bû,
Xatûn sor bû, wa sor bû,
Xatûna sora selam,
Padşaê sora emr û tev.

Bimbarek be, bimbarek,
Nezerê Mêrxas bimbarek,
Xatûna nazik bimbarek,
Dinyayê temamra bimbarek.

## 6

Tu nebêje, padşay cînarê welatê wan, evê qîzikê xwestibû. Çaxê ku dibhê qîz nedane wî, dane yekî dinê, esker berev dike, tê ser hevt bira şer.

Ev hevt dêw diçin cem Nezerê Mêrxas, gilîyê şer elamî wî dikin, serê xwe ber wî nimz dikin, disekinin, emr jê dixwezin.

Nezerê Mêrxas wextê ku dengê şêr dibhê ditirse û diricife, derdikeve devra, ku bireve here gundê xwe. Merîya jî zanbû, wekî dixweze pêra-pêra derkeve hucum ke ser ordîya dijmin. Dikevin ber lingê wî, digrin û jê teweqe dikin, dibêjin:

– Tuyê bêçek, bêsîleh, tuyê tenê kuda herî? Tu çi dikî? Te ji xwe dest kişandîye, çi bese?

Çek û sîleh, tînin didin Nezerê Mêrxas, jin jî birêd xwe reca dike, wekî nehêlin Nezerê



Mêrxas ji mêrxasîya xwe kubarbûyî tenê hucum ke ser ordîya dijmin. Ev xeber diçe dighîje ordîyê û mexluqetê, cesûs jî ev gilî digihînin dijmin, ku Nezerê Mêrxas bêsîleh, bêçek difirya berbi deşta şêr, ancax karibûne zeft kin û dorgirtî tînin...

Hespeke kehêl tînin deşta şêr, ku Nezer sîyar be. Esker jî pêra eşq bûyî bi qalmeqaleke giran pêra gazî dike:

– Xweş be Nezerê Mêrxas... mirin dijminra.

Kihêla Nezer, ku dibîne ser piştê yekî bêkêr rûniştîye, dike hîrehîr, serê xwe hildibire û difire ber bi pêş, hema rast ber bi ordîya dijmin diçe. Esker jî tirê Nezerê Mêrxas dest bi hucumê kir, ûre gazî dikin, xwe jî hucum dikin, mîna brûskê xwe digihînin dijmin. Nezer ku dibîne nikare dizgîna hespê xwey ke, hindik dimîne jê bikeve, destê xwe davêje, dixweze xwe darekîva bigre, lê tu nebêje dar rizyayîye, çiqlekî qasî kêlanekî dişkê û destê Nezerda dimîne. Ordîya dijmin, ya ku berêva nav-dengê Nezer bihîstibûn û dilê wan tirsêva tijî bû, ev yek jî ku bi çevê xweve dibînin, êdî çokê wanda

qudum namîne, berê xwe diguhêzin, bireve, de bireve, herkê ku mêrî serê xwe xilas ke, ku Nezerê Mêrxas dara bi kokêva radike û tê...

Wê rojê jî dijmin çiqas bêjî kuştine, yêd mayîn şûrêd xwe datînin bin lingê Nezerê Mêrxas, elam dikin teslîmbûna xwe û altbûna xwe.

Û Nezerê Mêrxas bi egîtî ji deşta şêr vedigere tê kela dêwa. Mexluqet ser rîya wî eşq û şabûneke gran hazir dike û bi ûre, bi gazî, bi dest li hevxistin, kilam û def û zurnêva, bi qîz û gulava, bi wekîlava û xeberdanava tên pêşîya Nezerê Mêrxas, sîyanet û hurmeteke usa nîsan didin, wekî Nezer ecêbmayî, şaşbûyî dimîne.

Bi hurmet û sîyanet Nezer tînin dikin padşê xwe, dibin ser textê padşê didin rûniştandinê.

Nezerê Mêrxas dibe padşe, wan dêwara jî, her yekîra karekî dide. Nişkêva dibîne ku dinya temam destê wîdane.

Dibêjin ku heta roja îroyîn jî Nezerê Mêrxas hê dijî û padşatîyê dike. Û çaxê ku derheqa egîtîyêda, aqilda, bîlyantîyêda cem wî xeber didin, Nezer dikene û dibêje:

– Çi egît, çi aqil, çi bilyantî, gişk jî xeberê valane, şixul ewe wekî bextê merîya hebe, bextê te heye, kêf bike…

Û dibêjin, wekî Nezerê Mêrxas heyanî îro jî kêf dike û ser dinyayê dikene.

